

## Agahdarî ji bo qursa Întegrasyonê

Ji bo kesên biyaniyên, ku mafê wan heye an bo kesên, ku nuh hatine vira û divê herne van qursan û biyaniyên, ku demek dirêje li Almaniya dijîn

Hemwelatiyên hêja,

Gor zagona mafê rûniştinê, mafê we bo carekê heye, ku hûn serdana qursek întegrasyonê bikin an jî divê hûn herne vê qursê.

### Qursa întegrasyonê çiya?

Qursa întegrasyonê a tevahî ji 600 dersên zman û 60 dersên ahengdarî pêktên. Qursên zman ji çend beşan pêktên, ku her beşek ji 100 saetan pêktê. 300 saetên pêşî wek qursên zman a bingehî û 300 saetên dawî jî wek qursên pêşketinê tene bi nav kirin.

Di qursên zmande hûnê gelek peyvên, ku bo we rojane pêwistin hûn bibin. Wek têkiliyên we ên bi daîrên fermîre, danûstandina bi cîran û hevalên we ên cihê kar, nivîsandina nameyan û tijekirina Formûlêran jî hûn bibin.

Qursên ahengdarî wê we di derheqê jiyana li Almaniya û zanistiya di derheqê qanûnên rêkberê de , çand û dîroka nuh a vî welatî de agahdar bikin.

Qursên integrasyonên taybet, wek mînak bo jinan, bo dê û bavan, bo cwanan û bo kesên, baş xwendin û nivîsandinê nizanin jî hene. Ev qursana ji 960 dersan pêktên. Gava ku hûn pirr zû fêr bibin, hûn karin serî li qursa intensivê bidin. Ev qurs 430 dersan dom dike.

Kîjan qurs bo we a raste û ji kîjan beşê hûn destpêbikin, wê rêvebirê qursê bi testekî berî destpêkirina qursê tesbit bike.

### Tevlêbûna test a xelaskirinê

Testa xelaskirinê ji testa zman û îmtihana qursa ahengdarî pêktê. Gava hûn di testa devkî de bi dine tesbît kirin, ku hûn têra xwe zmanê almanî hûn bûne û di testa qursên ahengdarî de jî bi serkevin, wê gavê hûn qursa integrasyonê bi serfirazî xelas dikin û hûnê „Zertifikata qursa întegrasyon“ bistînin.

Gava hûn bi ser nekevin, hûnê gora merhela zanîna xwe belga xwe bistînin.

Îmtihana xelaskirinê bê pereye.

### Feydên tevlêbûna qursên întegrasyonê

Biyaniyên ku ji welatek ne endamê yekîtiya Ewropa hatine û gava bixwaze li Almaniya mafê rûniştinê ê herdemî bistîne, divê hin mercan bîne cih. Gel hin tiştên din, divê bas fêrî zmanê almanî bibin û wekî din di derheqê zagon û nizama civakî de û di derheqê rewşa jiyana li Almaniya xwedî zanyariyên bingehî bin. Ev mercana bi serfirazî tikakirina qursên întegrasyonê tene cih. Her wekî din hûn karin berê demê xwe mafê hemwelatî jî bistînin.

Her wekî din bi hînbûna zmanê almanî di qursên întegrasyonê de wê jiyana we a rojane li almanya çêtir bibe û şensê we bo bi destxistina kar wê zêde bibe.

### Qeyda bo qursa întegrasyonê

Gava mafê we hebe an jî divê hûn tevî qursek întegrasyonê bibin, wî demê hûnê nivîsek çesdandî (Belga di derheqê hebûna mafê we de) an jî daîra biyaniyan an jî ji daîra „Arbeitslosengeld II“ ya ku bo we berpirsiyare bistînin. Li gel wî wê lîsta dezgehên ku nêzî cihê we ê rûniştinê qursan amade dikin, bo we bê şandin.

Ji kerema xwe re qeyda xwe li cem rêvebirekî qursê, heya ku ji dest tê zû, çêkin û belga ku mafê we ê tevlêbûna qursê pêşkêşî wî bikin., heke dema qursê li ser belga tevlîbûnê mîna „Besbûnatevlîbûnê ta vê .....demê“ hatiye nivîsandin û ta xelasbûna vê demê mafê we ê tevlîbûna qursê heye. Ta wê demê hûn divê qeyda xwe li cem rêvebirê qursê çêkin..

Rêvebirê qursê divê dema destpêka qursê ji were bide zanîn. Piştî we xwe qeyd kir şûnde divê qursê mehan zêde dereng destpêneke. Gava di nava vê demê de qursê pêkneyê, divê rêvebirê qursê we agahdar bike. Wê gavê hûn karin biryara xwe bidin, an hûnê demek dinê rê bipên an jî serî li qursek din xînin. Di rewşek halo de, divê rêvebirê qursê kaxeza we a bo mafê tevlîbûna qursê şûnde bide we.

### Bi serûber berdewamkirina qursê

Ji ber ku hûn pêgihêjin armanca qursa integrasyonê, divê hûn bi serûber tev li qursê bibin. Ev tê vî vateyê, ku hûn bi serûber tevî dersan bibin û tevî testa dawî jî bibin. Bi serûber berdewamkirina qursê bo vê yekê jî girînge, ku ji bo hûn mesrefa rê bistînin û piştê bi karibin saetên darsa qursê careke din berdewam bikin. Gava hûn bixwazin, dê rêvebirê qursê serdana we a bi serûber nivîskî tesdîq bike.

Bi tevahî; guherandina qursê bi tenê piştî temamkirina beşeka qursê mumkin e.

### Buhayê qursa întegrasyonê

Divê hûn tiştê para xwe serê dersek 1.20€ bidine rêvebirên qursê. Ev mesrefa divê berê destpêka beşek qursê bo 100 dersan û berê destpêka qursên ahengdarî bê dayin. Gava hûn tevî hin dersan nebin, ev buhayê van dersên ku hûn tevî nebûne li we şûnde nahê vegerandin. Gava hatiniya we tune be, wî gavê ew kesê ku mesrefa we girtiye ser xwe, divê vê mesrefê bide.

Daîra federel kare li vê mesrefê bibore, gava ji ber hatiniya we a hindik razandina vê mesrefê bo we gelek zehmet be. Bo lê borîna ji mesrefa qursê, divê hûn bi nivîskî li ba temsîlkarê daîra federel a herêmî daxwaz bikin (li lîsta navnîşana mêze bike). Ji kerema xwe re çespondineke hewcedariya xweya aborî jî pêre bişînin (ku hene se qopîyê belgan jî tev bişînin mînak danezaneke perê betaliyê ya II, alîkariyên civakî, alîkariyên xanî, krediya xwendevanan [BAFöG), perê zarokan, nehfên ku li gorî Zagona li ser Nehfên ji bo Penaberan, bexşandina ji mûçeyên lîsansê rojane, bexşandina ji mûçeyên lîsansa radio û televîzyonê (GEZ), bilêta civakî ya heremî û hwd). Ji kerema xwe re wê daxwaznamê bi dîne qursê ku gengaz e.

Ku hûn „Arbeitslosengeld II“ distînin û ku daîra berpirsiyar we ji bo tevlêbûna qursa întegrasyonê mecbûr bike, wê gavê ji xwe hûn ne mecbûr in mesrefa qursê bidin. Di rewşek halo de ne pêwîste hûn daxwaznamê bidine daîra federel .

Bişûnvestandina lêçûyînên qursê

Ger ku hûn bi awayek biserketî tevî azmûna dawî bûn, piştî 8ê Çileyê Pêşîn ê 2007an Daîreya Federal a Koçberîyê û Penahberan dikare %50yê lêçûyînên we li we vegerîne. Lêbelê ji bo pêkhatina vê yekê divê di nava standina mafê tevlibûna qursê û azmûna dawî de ji du salan bêtir zeman derbas nebe.

Ji bo bişûnvestandina lêçûyînan dive hûn daxwaznameyekê bidin berpirsiyarê Daîreya Federal a Koçberîyê û Penahberan a herêmî.

Lêçûyînên rê

Ger ku hûn pereyê bêkarîyê II (Arbeitslosengeld II) distînin dê lêçûyînên rê ji aliyê daîreya berpirsiyar a ku tevlibûna qursê ji we re şert danîye li we werin vegerandin. , ku daîreya koçberîyê lêborîneke mesrefê ji we re bexşandibe, hûn desteka lêçûyînên rê distînin. Dîsa jî, çi dibe bila bibe, ji bo ku hûn ji vê yekê feyde bibînin dive cîhê qursê dive ji 3 kîlometreyî dûrtirî mala we be. Wek prensîbeke bingehî, dê bi tenê lêçûyînên rê yên ku berpirsiyarê nêziktirî ji we re dê li we were vegerandin. Ji kerema xwe re tevî berpirsiyarê xwe yê qursê binihêre ka pêdivî bi serîlêdana Daîreya Federal a Koçberîyê û Penahberan heye an tine ye.

Wek prensîb, lêçûyînên rê bi tenê ger ku hûn qursê tamam bikin dikarin werin dayîn.

Dubarekirina qursa pêşketinê

Gava hûn di testa zman de serkeftî nebin, hûn karin bo carekê heya 300 dersan () dubare bikin. Vî tiştê hanê her weha ji we re dike şert ku hûn bi serûber tevî dersan bûbin.

.

Gava hûn bixwazin tev li qursa zman a pêşxistinê bibin, divê hûn serî li daîra federel bidin.

Ger ku hûn tevî qurseka xwandin û nivîsandinê dibin, tevlibûna testa zman ne şert e.

Tevlibûna azmûna zimên a piştî dersên dubarekirî jî belaş in.

Bi armanca ku hûn dersan dubare bikin ji kerema xwe re serlêdaneke bidin daîreya heremî ya desthilatdar a Daîreya Federal .

Gava mirov mecbûrî tevlibûna qursê bibe tiştên balkêş

Gava daîra biyaniyan an daîra berpirsiyar a „Arbeitslosengeld II“ hûn mecbûr kirine, ku hûn tevî qursa întegrasyonê bibin, divê hûn di demeke herî zû de serî li rêvebiriya qursek integrasyonê bidin û bi serûber herne qursê.

Gava hûn wilo nekin, ev tiştana karin çêbin:

- Kare tesîrê li ser biryara bo dirêjkirina mafê we ê rûniştinê bike,
- Gava hûn alîkarî ji sosyalê bistînin, ev alîkarî kare bê kêmkirin.
- Daîra biyaniyan kare ji we daxwaz bike, ku hûn para xwe a mesrefan bo her dersên qursê 1 Euro serê dersekî, ji bo temamê qursa întegrasyonê berê destpêkê bi carekî ve bidin.

- Ceza peran bo we kare were birîn.

Gava hûn bi serûber tevî qursa întegrasyonê nebin, wî gavê rêvebirê qursa we divê daîra biyaniyan an jî daîra berpirsiyar a bo „Arbeitslosengeld II“ di vê derheqê de agahdar bike.

### Tiştên din ên divê ku hûn pê zanibin

⇒ Hûn dikarin hemû formên ku li vê derê hatine binavkirin ji birêvebirê qursê, ji daîreya koçberîyê an jî daîreya federal a herêmî ya Daîreya Federal bistînin. Tevlî vê yekê hûn dikarinli navnîşana înternetê ya “[www.bamf.de](http://www.bamf.de)”yê jî bibînin.

Di kaxezê hînkariyê de haydariyên herî girîng ên ji bo tevlîbûna qursa întegrasyonê hene. Dê birêvebirê qursa we derheqê kitkîteyan de we haydar bike.

Ji xeyn ji vê yekê ji kerema xwe re daîreyên şêwirmendîya koçberîyê û xizmetguzariya koçberîya ciwanan ji bîr meke. Dê ev daîre ji bo serîlêdanan alîkariye we bikin, bersivê bidin pirsên we yê heyî û ji bo pirsên we rê nîşanî we bidin û ji bo we qursa herî baş bibînin.

Hûn dikarin daîreyên şêwirmendîya koçberîyê û xizmetguzariyên koçberîya ciwanan ên li der û dora xwu ji daîreya koçberîyê ya herêmî, daîreya herêmî ya erkdar a Daîreya Federal a Koçberîyê û Penahbereran an jî ji navnîşana înternetê ya “[www.bamf.de](http://www.bamf.de)”yê hîn bibin

Ji kerema xwe re ji bîr meke ku tevlîbûna we ya qurseke entegrasyonê sîgortaya qezayê nahewîne nava xwe.